Australian Government

Department of Home Affairs

# Information about DNA testing for visa and citizenship applicants

# Agahiyên li ser testê DNA ji bo daxwazyarên vîze û welatîbûnê

Form
**1259i KURK**
KURDISH (KURMANJI)

## Derbareya DNA

DNA (Deoxyribonucleic acid) materyalek genetîk e li her hucreyê (xane) li bedenê heye. Ji bo nimûne, ew di nava xwînê, tif ê, çerm û porê de heye. Herkes DNA heye. Mirov ji dêûbavên xwe pêkhat ê DNA-ê ji digirin.

## Têstê DNA

Têstê DNA materyal ê genetic ji dû kes an pitir muqayese dikit takû piştrast bikin ku xizmêt hevin. Materyal ê genetic bo têstê bi piranî ji paçekî devê an nimûna xwînê werdigrin.

## Çima testê DNA ji bo hin daxwazyarên pêşniyar dikin

Department of Home Affairs (the Department) (WEzareta Karubarên Hûndir) testê DNA piştrast dike bi wateya peşkêşkirina delîlên ji bo îdîaya têkiliya malbata biyolojî kirin Bi piranî corên din delîlên mîna belgeya jidayikbûnê yan jî pirtûkên malbatê de berdest in. Bi herhal, testê DNA bijarteka başe dema belgên îdîaya têkiliya malbata biyolojî bêbawe yan ne bin.

Wezaret belku pêşniyar bikit ku testê DNA çê bikin bi watayê bo îspat kirina îdîaya têkiliya malbata biyolojî. Dema ku Wezaret bi delîlên îdîa têkiliyê we qayil nebe

Belku pêwîst be belgeyên pêwendiya malbatî pêşkêş bikin taku pîvanên wergirtina vîza yan welatîbûnê Ustralî bi cih bînin. Encamên testê DNA delîl î nîşan didit ser îdîaya têkiliya malbatî, ji bo nimûne têkiliya dê û bav-zarok an xwişk û birayên.

## Testê DNA ne îcbarî ye

Tu ne mecbûrî bi cîanîna testê DNA dema bikaranîna wê pêşniyar bibe.

Testê DNA ji hêla qanûnê nepêwîste. Corek din ya delîlî e.; bi piranî alternative e ji bo belgeya ji dayîkbûnê. Ger hûn biryar bidin testê DNA çê kin, Wezaret agahdariyê bidin ka çawa têstê berhev bikin li gor daxwazên Wezaret ê. Her têstê din ku derveyî van daxwazan çê bibit qebûl belku qebûl nebe.

Eger hûn biryar da testê DNA çê nekin, biryarê li ser vîza an jî bi esl welatîbûn we di daxwaznameya xwe dê were girtin li gor zanyarîyên cem Wezaretê heye di wê demê de.

## Nirxên testê DNA

Daxwazyarên vîzayên koçber yan jî bi esl welatîbûn pêwîste nirxên tam bo testê DNA bidin.

Wezareta mesrefên tam ya testên DNA ji bo daxwazkerên vîzeya penaberan didit. Lêblê, wxazyarên programa insanî taybet ku testên DNA bo wan were pêşkêşkirin mesrefên tam ya testên DNA didin.

## Şêwirdarî

Hûn dikarin şêwirdariyê bixwazin (şîret) ji pisporek tendrûstî yan doktorek destûrdar berî ku we biryara çêkirinê testê DNA bidin. Hûn dikarin şêwirdariyê bixwazin piştî encamên têsta DNA were zanîn jî.

**Têbînî**: Hûn ji bo her şêwirmendiya we berpirsiyarin bo dayîna mesrefê.

## Encamên têstê DNA yê çi nîşan didin

Testê DNA yên dê û bav û zarokan link biyolojîk di navbera wan de nîşan dide.

Di piranîya rewşan de testên DNA îdîa têkiliyê piştrast dikit.

Carna testa DNA encama zelal ser têkiliya endamên din ên malbatê. nade. Eger encam ne zelal e, laboratorê dê encamên şirove bikit.

## Encamên testa DNA ji bo çi bikar tê

Encamên testên DNA vekirî bo Wezaret dê ji bo armancên koçber tenê bikar tên.

## Agahiyên girîng der barê nepenîtiyê

*Privacy Act 1988 (Yasaya Nepentîtiyê 1988)* 13 Prensîpên nepenîtiyê Australî têde ku corê komkirina û bikaranîna agahiyên şexsî ji alî Wezaretê rêk dixe. Agahiyên li ser çawa Wezaret agahiyên şexsî kom dike, bikartîne û eşkere dike bo karên serekî xwe de di forma 1442i de tê dîtin *Privacy notice (Hişyariya nepenîtiyê)*. Agahiyên zêdetir li ser pratîkên danûstendina agahdariya gelemperî ya Wezaretê (forma 1442i di nav de) li karnama Nepentîtiyê Wezaretê tê dîtin ser **https://www.homeaffairs.gov.au/access-and-accountability/our-commitments/privacy**

Laboratorên testên DNA pêwîste rezamendî nivîskî hewe hebin berî şiyana eşkere kirinê encamên testên DNA bo Wezaret an bo sponserek.

Hûn dikarin agahiyên zêdetir li ser taybetmendî û nepenîtî encamên testên DNA ji laboratorê ku testên DNA çê dikit werbigrin.

## Laboratorên testên DNA

Ger Wezareta pêşnîyar bikit ku hûn testên DNA çê bikin, pêwêste hûn laboratorî testê hilbijêrin ku belgedar bit ji alî National Association of Testing Authorities, Australia (Komeleya Niştimanî ya Desthilatdariya Testê, Australya) (NATA)) ve Bo testên qanûna malbatî û pitir bo xwazyarên li derveya Australia were testkirin, ku pêdiviyên Wezaretê bi cih tînin bo testên DNA di çarçoveya navneteweyî de.

**Têbînî:** Pêwîste hûn kolekter î sampl î DNA ya destûrdar hilbijêrin.

Gava 3 binêrin li xwarê ser çawa laboratorî testê DNA hilbijêrin û gava 5 li xwarê binêrin ser çawa kolekter î sampl î DNA hilbijêrin.

## Proseya testê DNA.

Proseya testê DNA. pêngavên jêrîn heye:

1. Wezareta nameyek bo we dişîne pêşnîyar bikit ku hûn testên DNA çê bikin. Name wê agahîyê bide we ser testê DNA, proseya testê DNA. Û çawa laboratorî testê DNA u kolekter î sampl î DNA hilbijêrin.
2. Hûn biryar didin ku hûn dixwazin ku testa DNA bigirin. Hûn dikarin şêwirdariyê bixwazin ji pisporek tendrûstî yan doktorek destûrdar eger bivên, lê ew ê li ser xerca we be.

   Eger hûn biryar da testê DNA **çê nekin**, biryarê li ser vîza an jî bi esl welatîbûn we di daxwaznameya xwe dê were girtin li gor zanyarîyên cem Wezaretê heye di wê demê de.

© COMMONWEALTH OF AUSTRALIA, 2020

3. Eger hûn biryar da testê DNA çê bikin, pêwêste hûn laboratorî testê DNA hilbijêrin ku belgedar bit ji alî (NATA) ve Bo testên qanûna malbatî û pitir bo xwazyarên li derveya Australia were testkirin, ku pêdiviyên Wezaretê bi cih tînin bo testên DNA di çarçoveya navneteweyî de Ji bo ku lab laborator î bibînin:
   - here ser malpera NATA li **www.nata.com.au/accredited-facility**
   - ji bo lêgerînê li laboratorî testê belgedar, peyvên 'Parentage Testing' li 'Keyword' ya pencera lêgerîn têbixin u paşan dogma 'SEARCH' lê bixin.
   - Bi laboratuar we ya bijartî peywendî bikin taku tekez bin ku laboratuar şiyane daxwazên Wezaretê qebul dike.

     **Têbînî:** Heger hûn ê daxwazyar î vîzeyê penaber in. laboratorê dê ji we re tê hilbijartin.
4. Gava we laboratorî testê DNA bijartin, divê hun li gel laboratuar peywendî bikin daku randevûyê çê kin u mesrefên testên DNA berhev bikin.

   Li gel vê, divê hûn bi laboratorê re tekez bikin eger bivên formê 1528 *DNA Collection Statutory declaration* û formê 1527 *DNA Collection Cover sheet* bo wan boşînin taku ew bikarin wan forman dabigrin,îmza bikin û bo ofîsa prosekirina vîzayê verêkin. Formê 1528 û formê 1527 li malpera Wezaretê heye ser **www.homeaffairs.gov.au/allforms**

   **Not:** Heke hûn li derveyî Australia test kiribin, belku pêwîst nebe şablon î bo laboratorê bişînin taku dabigrin u îmza bikin heke wezaretê di amadekirina ser şablonên daxuyaniya yasayî ji laboratorê de bi taybetî çê kiriye.
5. Tu jî pêwîst kolekter î sampl î DNA hilbijêrin. û agahîyên pêwendî bidin bi laboratorî testê DNA da ku ew bikarin amadekarîyên ji bo berhevkirina testê bikin. Taku kolekter î sampl î DNA hilbijêrin
   - Eger hûn li derveyî Australia in - ofîsa prosekirina têkildarê derve divê niha ji we re lîsta kolekterên sampl î kirdba di nameya ofera têstê DNA ji yên ku tu dikarin yek hilbijêrin; an
   - Eger hûn li Australia in- divê hûn navenda berhevkirina pathology namzed bikin (an jî, di rewşên de li wir, navenda berhevkirina pathology nêzî wê derê nebe ) , doktorê giştî Australî dikarin daxwazên Wezaretê bicîh bikin ser sampil ê DNA wergirtin ji bo armancên qanûna malbatê.
6. Heke berê nehatiye çêkirin, laboratorê piştre dê pakêtê amûrê têstê sampl î û daxuyaniya yasayî bişînin eger pêwîst be bo
   - Eger hûn li derveyî Australia in- ofîsa prosekirina daxwaznama vîze an welatîbûnê. (Li gor pêdiviyên herêmî, lê belê, dibe ku rewş hene ku pakêtê amûrê têstê sampl î û daxuyaniya yasayî Yekser bişînin bo kolekter î sampl î DNA namzedê we.) yan
   - Eger hûn li Australia in – kolekter î sampl î DNA namzedê we.
7. Laboratorê têstî DNA dê piştre bi te re peywendî dikin taku bo lihevhatina komkirina samplên we û kesên ku têstê DNA girtîne. Samplên bi piranî ji bi paçekî devê an leke xwîna têne girtin.

   Nûnera Wezaretê **dive** amade bit dema samplên ji hemu beşdarvanên derveya Australya têne wergirtin. Carna, samplên ji hemu beşdarvanên li Australya dê lazime were şahîdandin jî.

   Testên DNA yên ku daxwazên Wezaretê bicîh nikin belku nehên qebûlkirin. (Testên DNA yên naskirinê qanûnî hene li Australya dibe ku bên qebûlkirin.)
8. Di dema wergirtina samplê DNA, dê formê 1526 *DNA Collection Consent declaration* ku li malpera Wezaretê heye dabigrin u îmza bikin (divê li gel wxe bibin û nîşana kolekterê samplê DNA bidin). Daxuyana rezamendî hewe bi watayê razîbûnê we ye ser eşkere kirina encamên têstên DNA bo Wezaretê. Her kesê samplî didit pêwîste formê daxuyana rezamendî dabigre di wexta wergirtina samplê û bidin bo:
   - Eger hûn li derveyî Australia in- şahîda Wezaretê, wê daxuyana rezamendî, di gel samplên, bo laboratorê têstî DNA peywendîdar bişinin (not, di rewşên kemîn de, dê her ew kolekterê samplê bit ku wê yekê dikit); yan
   - Eger hûn li derveyî Australia in û şahîda Wezaretê nebin kolekter î sampl î DNA wê daxuyana rezamendî, di gel samplên, bo laboratorê têstî DNA peywendîdar bişinin.

   Encamên têstî DNA dê bo hewe û Wezaretê têne şandin, û bipiranî piştî 14 roj ji tarîxa girtina hemû samplên ji alî laboratorê têstî DNA ve.
9. Eger encamên têstî DNA lînkek bîolojîk nepa nîşan bidin (bo mînak, têstî dêûbavî keşfî 'dêûbav'ya pêşkêşkar dikit), hûn dikarin şêwirdariyê bixwazin ji doktorek ku Hikumeta Australia dîyarî kirîye bo vê yekê, lê belê divê hûn mesrefa vî xizmetî bidin.

   **Têbînî**: Heger te pêwîstî bi xizmetên bi vî rengî ye û ta niha ve te şîretê negirtîyr ser çawa bi doktorek destûrdar peywendî bikin, hûn dikarin agahdarî bistînin ji ofîsa prosekirina daxwaznama vîze an welatîbûnê grêdayê Wezaretê.

## Ev agahî bixwînin bi zimanên din

Ev agahî bi zimanên bin de heye jî:

- Amharic
- Erebî
- Derî
- Fransî
- Hakha Chin (Dewleta Chin - Burma)
- Kurdî (Kurmancî)
- Kurdî (Soranî)
- Çînî (Sade)
- Somalî
- Tagalog
- Vîetnamî

## Agahiyên zêdetir der bare têstê DNA bixwazin

Heger ji te yan ji xizmekî te re hatiye xwastin têstê DNA çê bikin û pirsên zêdetir hebin û, an jî bêtir agahîya dixwazin ser têstê DNA, ji kerema xwe bi ofîsa Wezaretê ku pêşnîyara têstê ji were kiribû têkilî bikin an seredana malpera Wezaretê bikin ser **www.homeaffairs.gov.au**

| | |
|---|---|
| *Malper* | **www.homeaffairs.gov.au** |
| *Xeta lêpirsînê Giştî* | Telefona **131 881** di dema saetan karê li Australya bikin br operatorê re biaxivin. (Agahiyên tomarkirî derveyî van saetên hene). Heke hûn ji derveyî Australayê ne, ji kerema xwe bi nêzîktirîn mîsyona Australî re têkilî bike. |


© COMMONWEALTH OF AUSTRALIA, 2020